

## Smittestopp çî ye?

Smittestopp bernameyeke ku enstîtuya tendurustiya giştîya norwecê (NIPH) ew pêşve xistiye. Ev bername ji bo pêşîlêgirtina ji belavbûna vîrûsa Korona di civakê de, hatiye dîzayin kirin. Bikaranîna vê bernameyê bidilxwazî ye.

Eger hûn beşdarî testê bibin û diyar be ku tûşî vîrûsa Korona bûne, hûn dikarin bi vê bernameyê tûşîbûna xwe ji kesên din re ragehînin. Ji kesên din re tê gotin ku gengaze ew tûşî bibin û şîreta pêwîst ji wan re tê kirin. Ji ber vê yekê, bername pêşî li belavbûna nexweşiyê digire. Ev sepan ji kesekî re nabêje ku tû tûşî bûnyî.

## Ez ê çawa Smittestopp-ê li ser tîlefona xwe saz bikim?

- Sepanê ji App Store yan Google Play daxîn bikin.
- Di sepanê de, rêwerzên li ser dîmenderê bişopînin.
- Eger we nikaribû rêwerzan bixwînin, ji yê din bixwazin ku ew ji we re şîrove bikin.

## Sepana Smittestopp çawa dixebite?

Eger hûn nêzîkê kesî bibin ku li ser tîlefona wî ev sepan saz kirî ye, dê tîlefon dest bi danûstandina sînyalên bi hevûdu re bikin.

Eger encama testa korona virusa korona ya kesên din erênî be, dê sepan bi bîra we bîne ku tîlefona we nêzîkî kesekî tûşîbûyî bûye. Piştî sepan tê ji we re peyamek bişîne ku dibe hûn çî bikin. Her weha hûn dikarin hilbijêrin ka hûn dixwazin kesên din agadar bikin ku hûn tûşî bûne ye na.

Eger bername ji we re peyamek bişîne, ew tenê diyar dike ku hûn ber xetereya tûşîbûnê da ne û nasnameya kesê tûşîbûyî ji we re eşkere nake. Ne rêveberiyên giştî ne ji kesên din ji cîh an nasnameya we agadar nabin.

## Nepenîti

- Divê ji bo bikaranîna Smittestopp hûn ji 16 salan mezintir bin.
- Agahdariyên we dê piştî 14 rojan bixweber were jêbirin.
- Hûn dikarin herdem agahdariyên xwe ji sepanê rakin.
- Hûn dikarin sepanê li herdemê jê bibin.

**Alîkarî bikin ku jiyana vegere rewşa normal**